Pirs: Kak Mesud, bigor bir û bawerîya we di roja me rewşa tevgera rizgarîxwaza Kurdistanê li Heremê çawa ye û li Cîhanê de rewşa Tevgera Kurd çi ye?

Bersev: Tevegera Kurd ji bona gihaştinê bi Mafeyê xweyî Mirovanî û Milî di Herama Rojhilata navîn de pirî bi kevnarî tête dîtin. Bi deha sal vî Miletê hanê bi qehremanî û pehlewanî ji bona sitandina Mafeyê xwayî talankirî û bi cihanîna Mafeyê Çarekirina Sernivişta xwe bi hezaran baştirîn Keç û Lawên xwe di vê Rêya rizgarkirinê de daye bigorîkirin. Weha bes û bi tenha jî ji bona nimûne ji sala 1961 de tanî îro jî hêjî em li Kurdistana Îraqê ji bona vî mafeyê xweyî perest xebat û têkoşînê didin kirin. Vê xebata çekdarî li Kurdistana Îraqê û her wehajî Xebat kurd li seranserî Kurdistanê cihekî xweyî teybetîyî giring di Heremê de dayîte hiştin û ew dûr yanjî nêzîk bi hemû rûdanên vê Herama hanêyî pirî giring di vê Dunya me de pêve tête girêdan û her wehajî bi wan tête kêrkirin. Ayinda Çarekirina Pirsiyarîya Kurd bi ayinda vê Heremê ve tête girêdan û Pirsiyarîyên vê Heremê jî bê çarekirina pirsiyarîya Kurd jî ew ji hev nayêtin çarekirin. Ji ber vê jî hemû Hêzên Welatî, Demokrasî û Pêşverû jî di vê herema me de li gora zanebûna xwe û dilsoziya xwe ji bona Welat û Miletê xwe pişta xebate me didin girtin. Îro Pirsiyarîya Kurd ji her roj bêtir serê xwe bi xurtî di nava vê Herema hanê de dide berz û balakirin û çarekirina xwe bi darê zorê dide neçarkirin. Bi rast û durûstî Destana(Tiragodya) Kurdistanê bi xwe ew nema bêtir a me Kurdan bi xwe ye, lêbelê jî ew bi xwe jî a wan Miletan bi xwe ye, ji yên ku wan Kurdistan di nava xwe de ji xwe re dane parvekirin. Her wehajî pêrejî rewşa Tevgera Gelê Kurdistanê li seranserî Cîhanê di vê pêla me de gaveke pir mezin û giran ji xwe re dayîte avêtin. Rojekê ji Rojan weha navê Kurd û Kurdistanê li seranser Cihanê weha bi rûmet û dildarî nehatîye derketin. Bîr û bawerîya Dunyayê dûr yanjî nêzîk li gel xebata Rizgarîxwaza Kurdistanê tête dîtin. Ev li ser me Her û her dide pêwistkirin, ku em di vî warê hanê de şev û roj jî ji bona ragiyandina Bîr û bawerîya, Cîhanî li ser dadîya xebata xwe û pêwistiya çarekirina wêna ji bona parastina aramitîyê û aşîtîyê di vê Herema girng de li Cîhanê bidin agehdarkirin. Hîç Gûman tête nayête dîtin, ku rewşa Tevegera Kurdistanê li Cîhanê ji xwe re vejandineke nuh dayite wergirtin. Ev jî bi xwe jî veguhertineke nuh di şêweyê nayroka xebata me de ji bona Çarekirina Pirsiyarîya Kurdistanê li ser me , bi xwe jî di nav mejîyê me de dide kêrkirin. Tevî van dijwarîyên pirî ku pê xebata meyî Rizgarîkirinê jî pê tê rû bi rûkirin, ez bi xwe jî pir bi saya Xebata Gelê Kurdistanê û Sorbûna wîna ji bona Serxwebûna xwe pir bawermendim, ku ev xebata Netewê Kurdî Perçekî bi Serxwebûn, Yekitî û Xweşbûna Jînê dê bête bi tac û xelatkirin. Her wehajî ew dê bi dostanî û biratî li gel Miletên Rojhilata Navîn de di vê Herema meyî pirî giring de di vê Cîhanê me de bi xêr û xweşî bête jiyanîkirin. Azadîya me Kurdan bi azadîya van Miletên hanê ve tête girêdan û her wehajî Azadîya van Miletên hanê jî bi azadîya Miletê Kurdistanê ve tête girêdan. Miletekî azad Miletekî din jêrdestên xwe nade kirin. Weha bi vî Rengê hanê Berzanî em ji bona Dostanîyê û Biratîyê li gel van Miletên hanê dane fêrkirin û ji bona evîna Kurdistanê, Azadî, Serxwebûn û Yekitîya wêna şev û roj em dane pewerdekirin.

Pirs: Di rewşa hanê de hinek ji Problemên Tevgera Kurdî di her çar perçên Kurdistanê hene. Bi gor bîr û bawerîya we çarekirina van Problêman çawa çêdibin?

Bersev: Di sala 1514 de Kurdistana meyî xweşewist di nava Şahînşahîya Sefewî û Seletena Osmanî de hate perçekirin û ji wê roja tarî de jî bedbextîya Miletê me hatîye destpêkirin. Lêbelêjî hêjî bêter di dema Cenga Cîhanî yekem de, di sala 1916 de li ser Peymana Sagiks - Pîko li Bajarê Beyrûdê careke din li ser bingehê vê peymana hanê Welatê me duçarî parvebûneke din hate kirin. Vê carê Kurdistan ji bona çar perçan di nava çar Dewletan de bi darê zorî bê vîn û

evîna Miletê Kurd hate perçekirin. ji nûve,sinor li ser singa Welatê me hatin kişandin. Ji nûve hêjî bêtir sitema zordarîyê û hovîtîyê di nava Xakê Kurdistana me de ji bal van Dewletên nuh ve hate berz û balakirin. lêbelêjî tevlivêjî Miletê Kurdistanê bi hemû hêz û hinera xwe ve bi hemû dilsozî û mêrxasî serê xwe beramberî vê zordarîya dir û hov date bilindkirin. Ji wê rojê de Raperîn û Şûreşên Kurdistanê hêjî nehatine temirandin. Agirê vîn û evînê ji bona Azadîyê, Serxwebûnê û Yekitîya kurdistanê bêhnekê jî di nava Cerg û hinavên Miletê kurd de nehatîye rawestandin. Xebate me her û her li her çar perçên Kurdistanê her xebateke dadî ye, ew ji bona sitandina Mafeyê meyî Milî û yê Mirovanîyê tête kirin, belê hêjî bêtir ew ji bona bidawîanîna talankirina Kurdistana me û bende û kolekirina Miletê me tête kirin. Di nava rewş û zîneteke wisan de hîç gûman têde nayête dîtin, ku dê li her Perçeyêkî rewş û zîneteke xweyî tabeytî jî bête dîtin, lêbelêjî çewhera xebata me li her çar perçên Kurdistanê bi xwe tev mîna hevin û yekin. Li gora Bîr û bawerîya min çarekirina derdên her perçeyekî ji Kurdistanê divê em ji bona wî perçî bi xwe bidin hiştin û em tevaya perçên din tevaya karinên xwe şev û rojê ji bona kar û berjewendîya pêşvexistina Xebata perçê bi navkirî bidin tirxankirin. Xebata her Perçeyekî ji Kurdistan tevaya xebata Perçên din bi carekê ew bi xwe dide wênerîkirin. Xebata kurdistanê ji hev bi carekê nayête perçekirin. ew bi xwe yekitîyeke diyaliktîkî bi hev re dide pêkanîn. Dabeşvanên Kurdistana me her û her wan ji bona bikaranîna me ji bona kar û berjewendîya xwe dane bikaranîn. Ev rastîya hanê bi xwe jî tirştîrin û taltirîn rastî di xebata me de ye. Her wehajî vê jî bi xwe jî nehiştîye, ku em carekê ji caran jî nêzîkî bi serketina xwe bibîn. Lêbelêjî tevlîvêjî livêderejî divê bête gotin, ku şêweyê perçekirina Kurdistana me, Cihê wêyî Ciyografî, Belavkirina wêna di nava du Dewletên Mezin de û di pişt re di nava çar Dewletan de û hêjî bi serdejî Cihê wêyî siyasî û Sitratîcî û Dewlemendbûna Nefte wê van tevan bi hev re xebata me ji bona Serxwebûnê date dijwarkirin, lêbelê jî tev li van jî Şêweyî Ciyografîyî pêkhatina Kurdistanê jî ji çiyayên bilind û sengîn, ji dolên kûr, ji çem û rûbarên fireh ji nebûna rê û banan şêweyekî jiyanêyî taybetî bi hezaran sal li Kurdistanê date peydakirin, ku ew di nava nafka xwe de li paşvexistina me ji bona xwe her û her dide hilgirtin û di encamê dawî de xebata me bi ketinê tîne bidawîkirin. Weha li gora bîr û bawerîya min li ser me divê, ku em hûr û kûr li seranserîya Mêjûwa xwe bigiştî û li mêjûwa xebata Serxwebûna xwe bi taybetî lêbidin temaşekirin û ji nava wan fêrbûn û hînbûnên pir mezin û giran ji xwe re bidin sitandin, da ku xebata me bi kêmtirîn gorî û kurttirîn dem bi Armancên xweyî perest di rizgarîkirina kurdistan, serxwebûn û yekitîya wê de bête gihaştin. Ev jî bes û bî tenha di yekkirina xebata me de li seransrî Kurdistanê ji bona Azadî û Serxwebûna Welatê me têde têtê dîtin. Ez ji ber vê jî di vê qonaxa mêjûyîyî giran de di xebata Gelê kurdistanê de ji bona Hêzên Kurdistanê tevan bi carekê didim bangkirin: Ji bona Serwxebûna Kurdistanê û Yekitîya wêna Hevbigrin û biyekin. Evaya û bes evaya bi tenha xwe li gora bîr û bawerîya min, belê li gora bextê min, dilsozî û zanebûna min dermanê derdê me bi xwe ye.

Pirs: Kak Mesud, tu danyîn û sitandin di navbera Cephê Kurdistanî û Rejîma Îraqê de çêbuin ?
Ku çênebûne tu hewildan (mehewele) hene an niye ?

Bersev: Weke ku ez agehdarim, tanî îro hêjî di navbera Berê Welatîyî Kurdistanî de û di navbera Rêjîma Îraqêyî Xwînrij de tu dan û sitandin nehatîye dîtin. Rêjima Îraqê mîna her car ew dixwaze di rêya hin Berdevkên xwe de Hêzên Kurdistanî û yên Welatperwerên Îraqî ji berhev bi fen û xapandinan bide xistin, lê xiyalê vê Rêjima Xwînmêj pirî vala ye.

Pirs: Weke Partî, Piştî Rejîma Dagirker ya îraqê dijî Gelê Kurd çekên kîmyayî bi kar anî, di warê Stratejî de û Leşkerî de guhertinek çêkin ?

Bersev: Xebata Miletê Kurd di seranserî mêjûwa wî de ji berî Pênc hezar sal û vir de her û her wî beramberî Dujminên talankerên Welatê xwe bi rengekî Pêşmergeyetî, yanî bi şêweyê Partîzanî daye kirin. Van rastîyên hanê em li ser kêlên Somerîyan, Êlamîyan, Bobîlîyan, Aşûrîyan, Akadîyan, Partîyan û her wehajî ji berî çarsed salî jî ji Berî zayînê de li nik Zeyzefonê Yunanî jî dibinîn. Di dema Musulmantîyê de û her wehajî di dema hêrîşên Mengolyan de jî vî Şêweyê şer em li nik Kurdan dibînin. Bi diyarî jî tevaya şeweyê şerê me beramberî Imperetorîya Sefewî û ya Osmanî jî em dibîn û hêjî biserdejî tanî vê roja me jî her û her şêweyê şerê me bi vî rengê Partîzanî di nava çiya û deştên Kurdistanê de ji bona parastina Welatê me û Hebûna me tête kirin. Mero bi rast û durûstî dikare bêje: ku kurd di warê cenga Partîzanî de, cenga liberxwedanê de di seranserî mêjûya Dunyayê de pir bi nav û dengin. Vî şêweyê şer dûr yanjî nêzîk tevaya siyaseta me dayite danîn, ku her û her jî li ser vê jî di encamê dawî de jî xebata me dihate ketin û ew bi armancên xwe pê nedihate gihaştin. Belê ev şêweyî Şerkirinê, yê ku Mero jêre bi navê şerê "Bav û kalan" dikare bide binavkirin, tevî Gernasî û Mêrxasîya Kurdan jî ew nikarîbû li Paytextên dujminên me bihata bi serketin. Me dikarîbû her û her Dujminên xwe mîna Hirçekê bidin birindarkirin, da ku ew ji bal hineke din ve bête vegurandin. Tevlvêjî xebata meyî çekdarî jî li kurdîstana îraqê bi gavên pir mezin hate bi pêşvexistin. Me bi saya xebata Pêşmergên kurdistanê dikarîbû Heremên Rizgarkirî bidin firehkirin û Sipahê îraqê roj bi roj bînê lêbidin tengkirin û şikestinê û serşorkirinê tevî nuhtirîn çekên wîyî wêrankirinê jî jê re her û her bi pişk û parbikin. Faşîyên Bexdadê, Talankerên Kurdistanê ji bona wan nema çekên nuhî wêrankirinê ji Top, Tang, Belafirên Cengînî, Mûşek, Napalm, Fosfor, Bombên Goşînî ji bona talankirina dewlemendîya Welatê me û bi taybetî Nefta kurdistana me û kole û bendekirina Miletê me dida têrkirin; ji ber vê jî Rêjima îraqêyî Xwînmij û xwîrinj jî Kurdistana meyî ciwan û şêrin ji sala 1987 de tanî payiza sala 1988 de bi ber barandina Bombêm Kîmyawî date dan. Weha Zarok, Menal, Pîrek, Pîr û kalên me, belê Jîndarên ser xaka Kurdistana me bi bombên Kîmyayî didan kuştin, da ku ew liberxwedana vî Miletê Mêrxas û Gernas ji bona Mafeyên xweyî Mirovanîyê û Milî bide şikenandin. Weha bi hezaran Zarok û Biçûkên kurd, Pîr û Kalên wî hatin kuştin û her wehajî bi hezaran ji nava kurdistana rizgarkirî ji gemara tapanên Sêwîyên Afleqê Faşî hatin derkirin. Ew ji bona nava Turkî û îranê bi darê zorê ji bona man û nemana xwe hatin penakirin. Ev Kuştina Giştî û destpêkirina bi qirkirina Gelê Kurdistanê û valakirina Welatê wî ji bal Rêjima Xwînmêja îraqê bi saya barandina Kurdistanê bi çekên Kîmyayî li ser me bi darê zorê ev şerê man û nemanê dide neçarkirin, ku em bi carekê ji nuh ve li tevaya şêweyê Sitratîcîya xweyî Sipahê lêbidin venerandin û ji bînî ve tevaya şêwê Sitratîcîya xweyî Sipahî bingehê sirtatîcîya meyî siyasî li ser rûdanin nuh bidin danîn: Ev jî bi xwe jî tevaya şêweyê şerê "Bav û Kalan" bi darê zorê tîne bidawîkirin. Şêweyê Sitratîcîya Sipahîya meyî nuh bi carekê şêweyê rêxistina meyî siyasî û sitratîya meyî siyasî ji binî de dide veguhertin û her wehajî pêrejî piranîya armancên meyî siyasî jî bi xwe jî dide guhertin û li gel vê jî pêrejî tevaya pêwendîyên Kurdistanî jî ji nuh ve jî li ser bingehekî zanistî li ser hiş û berjewendîya tevaya xebata Azadî, Serxwebûn û Yekitîya Kurdistana me dide avakirin. Em di vî warê hanê de pir neha bi şêweyekî zanistî û li ser xwe û hêjî bêtir li ser berjewendîya Miletê Kurd li sernasî Kurdistanê di serxwebûnê de û xweşbûna jînê de bi kurttirîn dem û kêmtirîn gorî li van pirsên giring didin lêveneradin û serpêhatîyên pirî bi nerx ji wan didin wergirtin. Em bawerin, ku ev tevaya hevgirtin û yekkirina xebata Kurdistanê bi carekê dide pêwistkirin. Em bi Vîn û Hebûna Miletê xwe bawerin. Em bi azadî û serxwebûna kurdistana xwe bawerin û hêjî bêtir em bi Mirovanîya xwe bawerin. Dema Koletîyê û Bendîtîyê hatîye bidawîkirin. Rojekê ji Rojan ew bi xwe jî bi saya liberxwedana Gelê kurdistanê di nava Welatê me de ji pênc hezar sal û bêtir nehatîye dîtin.

Ev Miletê weha Mêrxas û Gernas, yê ku wî di seranserî mêjûwê de çiya, zinar, lat, teht û berên Kurdistanê li Dujminan bi agir kiribûn û Pêşmergên Qehreman xwedanê durujmê Kurdistan yanjî nemanê hêjî bêtir ew li ser vî durujmê perest sorin. Vê carê ew bi xwîna pakên Menalên Helebçe sûd û peymanê li ber tevaya dunyayê didin, ku ne bes tenê Kurdistanê dê di bin lingên Faşîyên Sêwîyên Efleq de, Qertelên Bexdadê de bi pilingên agir bidin kirin, na hêjê bêtir dê ew tevaya şerên xwe di nava Bajar û Gundên Faşîyên Bexdadê de bidin dadan û vêxistin. Ew dê dev ji vê xebata perest bernadin, tanî ku Talenkerên Kurdistanê ji nava Welatê me neyêntin pengizandin û Welat û Miletê me Azad, Serbixwe û yekgirtî neyête dîtin. Evaya tevaya armanca jîna me bi xwe ye, na hêjî bêtir ev bi xwe jî Mirovanîya me bi xwe ye. Em hatinê vê Dunyayê, da ku em jî serbest û azad mîna Mirovan bextiyar di nava Welatê xwe de bêtin jiyandin. Me Azadî, Wekhevî û Biratî divê. Me Koletî, Benditî û Bindestî navê.

Pirs: Kak Mesud, em dizanin partî di warê Leşkerî de pir bi hêze, gelo hember van kiryarên nemirovî ya Rejîma Îraqê çima hûn Opesyonên Leşkerî çê nakin?

Bersev: Piştî bi pirî bi karanîna çekên Kîmyayî di nava Kurdistanê de û derkirina bi hezaran ji nava Heremên Rizgarkirî şerê me li gel Rêjîma Îraqê pirî bêtir hatîye dujwarkirin; ji ber tevaya Heremê hatîye çolkirin û pêrabûnên leşkerî deha hatine dijwarkirin. Tevlivêjî me pêrabûnên Leşkerî beramber bi Dujmin nedane rawestandin. Li kûderê kês bi Hêzên me dikevin, li wê derê em destên xwe beramber bi Dujmin didin daweşandin. Em li gora karîna xwe bêhnê bi Dujmin nadin. Lêbelê li vê derê jî careke din jî divê bête gotin: piştî avêtina çekên Kîmyawî di nava Kurdistanê de û bi taybetî jî beramberî xelkên bê guneh ji Zarok û Menalan, ji Pîr û Kalan, belê dijî tevaya Jindarîyê li ser xakê me û pêrejî dijî hemû yasa û qanûnên Navdewletan jî û bi taybetî dijî Lihevhatina Cinêf der sala 1925 de, ev tevde Dirîtî û Hovitîya Rêjîma Basîyên Faşî li Bexdadê bi diyarî ji tevaya Dunyayê re dide derxistin û her jî ev jî bi xwe jî li ser me dide neçarkirin, ku em bi carekê Sitratîcîya xweyî Sipahî û pêrejî li gel jî tevaya Sitaratîcîya xweyî siyasî jî ji nuh ve jî lêbidin temaşekirin û veguhhertin. Weke me li jor date xuyanîkirin, piştî barandina Kurdistanê bi çekên kîmyayî li gora bîr û bawerîya min em nema dikarin bi rengê şerê berê, belê Şerê "Bav û Kalan" bi serketî beramberî vî şêweyê Şerê kimyawî bêtin biserketin. Ji ber vê jî bi darê zorê jî li ser me jî tête neçarkirin , ku em tevaya Sitratîcîya xweyî Sipahî û pêrejî Sitratîcîya xweyî siyasî divê em bidin guhertin, da ku em bi kurttirîn Dem û Kêmtirîn Gorî talankirina Welatê xwe û kole û bemdkirina Miletê xwe bidin hilanîn û Dujminên xweyî Dir û Hov jî nava Welatê xwe bidin derkirin û pengizandin û em bi aramancên xweyî perest di Azadî, Serxwebûn û Yekîtîya Kurdistana xwe de bêtin gihaştin.
Bi karanîna Çekên Kîmyawî di nava kurdistana me de, belê di nava Rojhilata Navînî de, na hêjî bêtir di cara pêşî de di mêjûwa Mirovanyê de dijî Xelkên bêguneh, dijî Zarok û Menalan, Dijî Pêrek, Pîr û Kalan ji tevaya Mirovên vê Dunyayê re Dirbûn û Hovîtîya Faşîyên Sêwîyên Efleq, Qertelên Bexdadê beramber bi Gelê Kurdistanê dide derxistin. Ew şopên bi karanîna çekên Kîmyawî pir kûr û bi tirs bi darê zorê dê xwe di nava Rojhilata meyî Navîn de bide hiştin. Em tev dizanîn, ku Miletek di vî sedsalên Bistan de mîna Netewê Kurdî perçerî bikaranîna Çekên Kîmyawî ji ser rûwê zemînê nayête hilanîn û qirkirin, lêbelê hîç gûnman têde niye, ku dê derd û kulên vî Miletê Reben û Belengaz bi deha car bêtin bêtirkirin. lêtevlivêjî em bi rastî jî dikarin ji neha de ne bes tenê ji bona Faşîyên Bexdadê bidin diyarkirin, lêbelêjî ji bona tevaya Dunyayê re bidin xuyanîkirin, Ku bi karanîna çekên kîmyawî di nava Kurdistana me de agirê man û nemanê li Rojhilata Navîn dide vêxistin û ger jî bes û bi tenha jî bi ava me mabe em dikarin di encamê dawî de Faşîya Bexdadê bi xurtî bidin tewilandin û bestandin. Ava kurdistana me di ayinde de bermberî faşîya Efleqî gewretirîn çekê me bi xwe ye. Em Hîvîdarin, ku Netewê Erebîyî Merd û bi Rûmet, Dirwasa,

Dost û Birayên me dê ew bi xwe jî vî karê hovîtî li bal Faşîyên xwe bide Tawnbarkirin û rawestandin, da Ku Netewê Kurd û Ereb bi Dirawsetî bi Aşîtî, bi Dostanî û Biratî li gel hev di Serwxebûnê û Xweşbûna Jînê de bêtin jiyandin.

Pirs : îro Jimareke zêde ji 50. hezar penehende li Kurdistana Tirkiyê dijîn. weke ku em dibînin Rewşa wan gelekî dijware û nexweşe. Tu alîkarîyek ji Rêxistinên Internationalî ji wan re negihiştine.
Hûn wek Partî li ser rewşa wan çi difikirin ?

Bersev: Belê ev penahindên hanê ji ber barandina kurdistanê bi çekên Kîmyawî ji bal Rêjima îraqê ji nava Heremên rizgarkirî hatin derktin. Ew di rewş û zîneteke pirî bed de dijîn. Bedbextîya Miletê me wê çaxê date destpêkirin, gava ku ew di sala 1514 û di pişt re li ser bingehê peymana Sayks - Piko di sala 1916 de careke din jî ji hev hate perçekirin. Ev bedbextîya hanê jî her û her jî dê bête dîtin, tanî ku ev perçebûna Welatê me bête hiştin.
Ji bal Rêxistinên Navnetewî alîkarî ji bona penahindên Kurd li Turkîyê dixwazin bidin kirin, lêbelî ji bal Serdarîya Turkî kelem û kosb ji bona vê alîkarîyê têtin dîtin. Hêjî penahindên Kurd Li Turkî nenala penahindan li wan tête temaşekirin, lêbelê bi rast jî ew ji bal Serdarîya Turkî nala Dîlên Cengê li wan tête nerîn. Ev bi xwe ji dijî hemû yasa û qanûnên Navnetewî jî tête derketin. Ji ber vê jî Partîya me, Partîya Demokratî Kurdistan li seranserî dunyayê li nik Sazmendîyên Welatî û li nik yên Navnetewî dide xebatkirin, ku ev penahindên hanê nala penahindan li wan bête temaşekirin û ew bxweser bi Rêxistina Penahindan ya Yekgirtina Netewan ve bête girêdan û ew bi xwe Serpereştîya wan bide kirin û hemû yarmetî di wê rêya hanê de ji bona wan bête rêkirin û di wê rîyê hanê de bi xwe jî ew bête parvekirin. Weha em di vî warê hanê de didin karkirin. Her Wehajî em didin remankirin, ku li ser me divê, ku em xebata xweyî siyasî bêtir û bêtir li gora dayînên neha bidin bipêşvexistin û pêrejî li geljî şêweyê xebata xweyî çekdarî li ser bingehên nuhî pêwist bidin veguhestin, da ku em bikaribin van Penahindên Kurdistanê bi serfirazî careke din ji bona nava xakê xwe bidin zîvirandin.

Pirs: Çawa ku hûn jî dizanin Partî Demokratî Kurdistan ( li Kurdista başûr) yekitîya xwe pêkanî. Hûn li ser vê yekitîya hanê çidifikirin?

Bersev: Me Kurdan di tevaya mêjûya xebata xwe de ava zirayê duberî û berberîya xwe her û her daye vexwarin. Vê malmîrata hanê bi hezaran ji baştirîn keç û Lawên Kurdistanê dayite binaxkirin. Dujminên me her û her ev Duberî û Berberîya hanê di nava me de ji xwe re didan gûrkirin û di encamê dawî de jî wan em pê didan xistin. Bi sedan sal û tanî vê roja hanê jî Dewletên Dagîrkerên Kurdistanê vê siyaseta duberîyê û berberîyê di nava kurdan de didin vêxistin û dadan, da ku ew Dewlemendîya Welatê me ji xwe re bêtir û bêtir bidin talankirin û bi serdejî Miletê me ji xwe re wî bidin kole û bendekirin. Dermanê derdê me, belê hîjî bêtir tevaya dilsozî û zanebûna me ji me re yekitîya me dide derxistin û pêwistkirin. yekitîya me û hevgirtina me ji bona Serxwebûna Welatê me û yekkirina wîna evaya armanca jîna me bi xwe ye, na hêjî bêtir ew bi xwe Mirovanîya me bi xwe ye. Ez ji serpêhatîyeke pirî tal û zirav van rastîyên hanê dibêjim. Ez mina her Kurdekî Welatperwer pir dilşad û bextîyar dibim, gava ku Partîyên kurd hevdigrin, yanjî ew bi yek dibin. Bi vê yekbûna we ez we ji dil û can pîrozdikim. Ez hêvîdarim, ku ev yekitîya hanê jî dê Xebata me ya perest ji bona yekitîya me û serxwebûna Welatê me bide bipêşvexistin û xurtkirin.

Pirs: Kak Mesud dîtina we ji bona Cepheyek Demokratî û Nêştîmanî li tevaya Kurdistanê çiye?

Bersv: Ger em bên hûr û kêr li tevaya mêjûwa xebata xwe bidin temaşekirin, dê emê nala nîşana belû dûberîya xwe û neyekbûna xwe di nava wê de bidin dîtin. Ev bi xwe jî dûr yanjî nêzîk tanî vê roja hanêyî me tête dîtin. Welatê me Dujminên me di nava xwe de ji xwe re li hevdû dane parvekirin. Sînorên çêkirî Dujminên me li ser singa Kurdistana meyî şêrîn û xweşewist ji bona talankirina wê û bendekirina Miletê me ji xwe re dane kişandin. Dewlemendîya Welatê me ji xwe re didin talankirin. Miletê meyî bêguneh di nava xwîna wî de ji xwe re didin vegevezandin û hêjî bi serdejî wî ji hemû Mafeyên wîyî Mirovanîyê û Milî didin bê pişk û parkirin, na hêjî bêtir bi serdejî ew wî ji xwe re jî didin kole û bendekirin. Gerjî ew jî ji bona biçûkditîrin Mafeyê xwe jî ji xwe re bide xebatkirin, ew wî bi hemû çekên wêrankirinê û bi serdejî vaye bi çekên Kîmyawî dixwazin wî bidin qirkirin. Em bi tevaya rastîya tirş û talbûnê dîvê ku em ji bona Miletê xwe bêjin: ku Dujminên me, Digîrkir, Talanker û Wêrankerên Kurdistanê ji dil û can dixwazin û şev û rojê jî ew jê re didin karkirin û xebatkirin, da ku ew Miletê Kurd ji xwe re li ser rûwê xaka Kurdistanê bidin kole û bendekirin, nahêjî bêtir wî ji xwe re bidin qirkirin. Ev rastîya hanêyî pirî tirş û tal di vê roja me de li ser me kurdan bi carekê li seranserî Kurdistanê dide neçarkirin, ku em ji bona Hebûna xwe, belê ji bona Mirovanîya xwe divê hevbigrin û bi yekbin. Bêyî vêna ev Miletê Mêrxas, Gernas û Kevnar dê bi darê zorê bi neçarî duçarî nemanê bête kirin. Em bivên yanjî nevên ev yekbûna me li seranserî Kurdistanê ji bona Azadî, Serxwebûn û Yekkirina Welatê me bes û bi tenha rêya man û nemana me ye. Ev bes û bi tenha dermanê derdê me bi xwe ye. Ji ber vê jî ezê dê tevaya jîna xwe ji bona vê bihevgirtinê û biyekkirinê bidin tirxankirin. Em mîna partîya Demokratî Kurdistan şev û rojê li gel hemû hêzên kurdistanîyî din jî xebatê ji bona pêkanîna Berekî Welatîyî Demokrasî ji bona Azadî û Serxwebûna Kurdistanê dê bidin xebatkirin. Pêkanîna Berekî weha li seranserî kurdistanê bi gihandina armanca perest di yekbûna Welatê me de û bi Serxwebûna Kurdistana me dide mujdekirin. Evaya bi xwe bes û bi tenha divê birast û durûstî Berseva Netewê kurdî perçekirî ji bona lêdana kurdistanê bi Çekên kîmyawî ji bal Faşîya Efleqî bête dan. Bêyî vêna em rêya xwe ji bona Mafeyê Çarenûsa xwe, belê hêjî bêtir ji bona Mirovanya xwe didin dûrkirin û gorîyên xwe deha bêtir didin pirkirin û hêjî bi serdejî ji xwe re û ji tevaya Dunyayê re jî nezanî, bêvacî û netêgihiştina xwe beramber bi çarekirina pirsiyarîya xwe bi eşkere didin diyarkirin. Ez hêvîdarim, ku dê hemû Dilsoz, Welatperwer, hemû Sazmendî û Partîyên Kurdistanê ji bona hevgirtin û pêkanîna Berekî Welatîyî Demokrasîyî Kurdistanîyî Giştî şev û roj bidin karkirin û xebatkirin, tanî ku Kurdistana meyî perest bi carekê ji bin tapanên Dagîrkeran, Talankeran û Wêrankeran bête azad û serbestkirin.